

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEW ROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar (152) Sal 27 11 Tîrmeh 2022 z - 2634 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (100)L.S


# Tevî hemî êş û azaran... Paşeroj ji gelê me re ye!




**Desteya sernivîser**

Piştî ku şoreşa Agirî (19261930-) bi serkêşiya General Ihsan Nûrî Paşa li ser destê Turkiyê bi alîkariya dewleta Îranê hate şikandin, berpirsên dewletaTurkiyê yên çavsor, bi hovîtiyeke kesnedî Kurdistan wêran û kavil kirin, bi hezaran mêr, jin, pîr û kalên Kurdan qir kirin, Kurd koçber kirin, bi dehê hezaran li ser rêyên koçberiyê mirin, li çolan hatin binaxkirin û di rojnameyên xwe yên fermî de bi vê serketinê(!) keyf û şahî kirin. Nîgareke karîkatorî belav kirin ku ew gornek li ser çiyayê Agirî bû, li ser kêla wê çend rêzik bi vê wateyê hatibûn nivîsandin:

«Ew Kurdistana ku we hewlda ava bikin, di vê gornê de hatiye veşartin!».

Lê, bi demê re aşkere zelal bûye ku, nivîskarên wan rêzikan ketine gorê, .....

2

# «Xelata Kemal Henan» bû para nivîskarê Kurd KONÊ REŞ

Îsal, Komîta»Xelata Kemal Henan» biryar da ku xelatê bide nivîskar û lêkolînevanê Kurd KONÊ REŞ-Qamişlo.

Konê Reş, li dirêjiya dehê salan e ku di warê rojnamegerî û nivîsandina bi zimanê Kurdî mijûl e, ji bilî taybetiya guhdan û lêkolînên wî li ser malbata Bedirxaniyan, gelek berhemên wî bi zimanê dê hatine afirandin û pitûkxaneya Kurdî dewlemend kiriye,

Îro, roja Înê, 22ê Nîsana 2022Z, di ahenga Cejna Rojnamegeriya Kurdî de ku li Navenda Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê/ Qamişlo hate lidarxistin, bi beşdariya gelek nivîskar, rewşenbîr, zimanhez û hunermendên Kurd, Xelat, radestî nivîskar Konê Reş bû.



Bi navê Komîta»Xelata Kemal Henan», em kekê Konê Reş pîroz dikin û hêviya pîşveçûn û serkeftinê jê re dikin.

Komîta»Xelata Kemal Henan»

*Qamişlo*
*22.04.2022z-2634K*

**Tevî hemî... Dûmahîk**

gelê Kurd û welatê xwe Kurdistan zindî mane, û her dê zindî bimînin. Wekî her car, gel birînên xwe derman kirine, welatê xwe, xaka bav û kalan bernedaye, û ji bo bidestxistin û wergirtina mafên xwe yên netewî li her çar kinarên welêt, kar û xebata xwe berdewam kiriye.

Di vê serdem û qonaxa me ya nûjen de ku gelek guhertinên kûr di siyaseta cîhanî de rûdane, rikberî di navbera hêzên mezin ên cîhanê de tûj bûye, kirîzên aborî li gelek dewletan serî hildane, ji bilî guhertina jîngehê ku bûye egera derketina gelek êş û nexweşiyên giran, lê, derdê herî bi êş û jan ew e ku rola Rêxistina Navnetewî UNê di civaka cîhanî de qels bûye, şer, pevçûn, kuştin û rijandina xwîna mirovan li hawîr belav bûne. Ji ber ku sermiyan û berjewendiyên fabrîqeyên çekan siyaseta dewletên mezin ên xwedî rol destnîşan û nîgar dikin, nirxên mirovatî û mafên mirovan li şûn mane, hêminî û aştiya cîhanî leq bûye, tu rêz û rûmet ji mirov û mirovatiyê re nemaye!

Di siha vê rewşa girik de, dewletên herêmê ku gelê Kurd û welatê wî dabeş kirine, nemaze dewleta Turkiyê, qirkirina gelê Kurd bûye sernav û navnîşana siyaseta wê! çi li li Herêma Kurdistanê, çi jî li Bakur, Rojava û Rojhilatê Kurdistanê, dijî hebûn û hêviyên gelê Kurd dixebite.

Li şûna ku gelê Kurd ê di şerê cîhanî yê dij terorê de biserket û rêxistina Da'iş û xuhên wê şikandin ji bal civaka cîhanî ve bê xelatkirin û ji dîliyê bête rizgarkirin, îro ew li ser destê dewleta Turkiyê tûşê şerê nemanê dibe, ji xaka bav û bapîrên xwe tê derkirin û biyanî li şûna wî têne çandin, hêzên mezin ên xwedî rol, ji bo berjewendiyên xwe li hember vê tewana nemirovane kerr û lal in, bê deng in!, ne tenê wilo, hin ji wan xwe bi derew û nîqên berpirsên vê dewletê didine bawerkirin, û li kêleka vê sitema hovane radiwestin!

Lê, ji bo naskirina rastiyê, divê em Kurd jî li kêmasiyên xwe mikur bên, bi wêrekî wan destnîşan bikin, bi hişekî vekrî çareseriyê ji wan re bibînin. Li ser serê pirsgirêkên me yên navxweyî, perçebûn û belavbûna hêzên me yên siyasî ye. Dûr ji saloxan û diruşmên pûçî vala, giringe em hemû, çi tevgera siyasî, çi jî ya civaka şaristanî û çi jî rewşenbîr û kesayetiyên serbixwe, li xwe vegerin, nerîn û cîgehên xwe li gor demê binirxînin û biryarê bigrin, hevkarî, karê hevbeş û destê biratiyê dirêjî hev bikin, û em hemû bawer bin ku çand û gotara zikreşî û berberiyê di bin çi navnîşanê de be û ji kîjan alî derkeve, ew ziyanê dide doza gelê me, li şûna wê, em gotara lihevkirin û rêzgirtinê belav bikin û li gora ronahiya wê xebatê bikin.

Her baweriya me li cî ye ku hemû pilanên reş ên neyarên hebûna gelê me dê têkbiçin û gelê me dê bimîne, ew dev ji doz û mafên xwe nagere, û bila her kes û alî zanibe ku ta ku gelê me di bin nîrê sitem û zordariyê de bijî, devera Rojhilata Navîn hêminî û aramiyê nabîne, û tevî hemû êş û azaran, paşeroj ji gelê me yê Kurd re ye.

## Xebatkarê Kurd Ferhad Şiblî tevlî kerwanê pakrewanan bû



Li Herêma Kurdistanê, di dema ku birêz Ferhad Şiblî ji ber nexweşiyê çûbû Herêmê, ew bi balefireke bê ajovan a dewleta Turkiyê hate armanckirin û jiyana xwe ji dest da.

Bi vê bûneya xembar, birêz Mihyedîn Şêx Alî/ Sekreterê Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd li Sûriyê YEKÎTÎ, birûskeke sersaxiyê arasteyî malbat, dost û hevalên wî kir.

Ev e li jêr, deqa wegera wê ji zimanê Erebî ye:

**Serxweşî**

Dilsoztirîn serxweşî ji malbata Pakrewan Ferhad Şiblî û endamên hevserokatiya Rêveberiya Xweser û hemî heval û hezkirên wî re pêşkêş dikim.

Ji nêzîk ve, me gorbihuşt nas dikir û me dizanî ta kîjan redeyê ew dilsozê pirs û doza gelê xwe bû. Di kar û xebatên xwe de, ew zîrek û canfîda bû, her ew geşbîn, xwedî vîn û hêviyên bilind bû. Di têkilî û daûstandinên xwe de, xwediyê zarzimanekî xweş û di nav hevalên xwe de hezkirî bû.

Diho, roja Înê 17ê Hizêrana 2022an, li Herêma Kurdistanê ew ji aliyê belefireke bê ajovan a Turkiyê ve hate armanckirin û li ser rêça xebatê jiyana xwe jidest da, û bi belavûna vê nûçeya dilêş, dilê milyonên Kurdan melûl û xemgîn bû, û ev tewana Turkiyê, cihê rûreşkirin û şermezarkrina wan bû. Nemaze ku dijayetiya dewleta Turkiyê ji hebûn û pirsa Kurd re li her derê hatiye aşkerekirin.

Careke din, li ser navê endam û alîgirên Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê YEKÎTÎ, em serxweşiya malbata pakrewan Ferhad û hemî dost û hezkirên wî dikin.

Qamişlo 18ê Hizêranê 2022 Z

**Mihyedîn Şêx Alî**

**Sekreterê Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê**

# 65 sal Ji damezrandina yekemîn rêxistina Kurdî li Sûriyê




**Desteya sernivîser**

Roja Înê, 14ê Hizêrana sala 1957an, di jiyana gelê Kurd li Sûriyê de rojeke dîrokî ye. Di vê rojê de, li bajarê Helebê, mala birêz Mihemed Elî Xoce, biryara damezrandina yekemîn partiya Kurdî li Sûriyê hatiye ragihandin û ji bal 7 xebatkaran ve daxuyan hatiye imzekirin.

Damezrênerên Rêxistinê ya ku bi Partî Demokratî Kurdistan hatiye binavkirin ev bûn: **(Osman Sebrî, Reşîd Hemo, Hemîd Derwîş, Mihemed Elî Xoce, Şewket Henan Nesan, Xelîl Mihemed û Hemze Niwêran)**, û rêzdar Reşîd Hemo bûye Sekreterê Partiyê.

Li gora hevpeyvînekê digel Dr. Xelîl Mihemed re, piştî salekê ji temenê Partî, Dr. Nûredîn Zaza tevlî rêxistinê bûye, û bûye Sekreterê wê.

Bêgomane ku li ser rêya kar û xebatê, di siha geşbûna hişkbaweriya netewî ya Erebî û nerîna şovînî li gelê Kurd û kêmneteweyên din ên li Sûriyê dijîn de, van mezinên me gelek cefa kişandine, bi salan di zindanên zordariyê de rojên reş û tarî ji temenê xwe derbas kirine, tûşî derd û xemên giran bûne.

Ji ber siyaseta nijadperest a dewletê, û hilwesta wê ya neyênî ji pêkhateyên Sûriyê, nemaze ji gelê Kurd û doza wî ya dadmend re, li Cizîrê, Ciyayê Kurmênc û Kobaniyê, bi hezaran xortên Kurdan tevlî Partiyê bûne û berevanî di ber mafên gelê xwe de kirine, li seranserî deverên Kurdî rêxistin xurt û belav bûye, cih girtiye.

Li hember geşbûna partiyê û hembêzkirina wê ji bal gelê Kurd ve, dezgehên Parastina Sûriyê, bêdeng nemane, û wê dest bi tepeserkirin û zindankirina serkirde û endamên çalak kirine, pilanên jihevxistin û tunekirina Partiya nûhatî danîne.

Di vê bîranîna pîroz de, bi kurtî be jî, pêwiste em hinekî li ser rewşa gel û tevgera wî ya rêzanî rawestin.

Dema mirov li rewş û tabloya tevgera rêzanî ya Kurdî temaşe dike, mijûl dibe, di warê hejmar, têkilî û danûstandinê de binirxîne, mirov noqî xemgîniyeke kûr dibe. Hejmara partiyên me, hemî sînorên pêdiviyan derbas kiriye, nemaze piştî ku kirîza Sûriyê rû daye, bi dehên partiyan hatine çêkirin. Ji hêleke din ve, mixabin ku destêwerdanên ji derveyî sînor di hûrguliyên tevgerê de têne kirin, digel dana peran, cîgeh û rûmeta tevgera me pir qels û lawaz kiriye, gel û tevger ji hev dûr xistine!

Bi kurtî, ji me hemiyan tê xwestin ku em li xwe vegerin, û di wê bîrbaweriyê de bin ku, tevî giringiya firehkirina xeleka dost û piştgiran ji dozê re, lê eger ne em li doza gelê xwe xwedî derkevin û berevaniyê di ber hebûn û mafên xwe de bikin, tu kes nake, û ev erkê me Kurdan bi xwe ye!

Ev dubendiya ku îro tevgera me tê de dijî, me berê xwe daye hev û em gotara kîn û berberiyê di civakê de belav dikin, em rê li pêş pilanên neyarên hebûna gelê xwe dûz dikin, û roja bidestxistina mafên gelê xwe dûr û dirêj dikin!

Cima gelo ji bo pirs û berjewendiyên gelên xwe, tevgera rêzanî li hemû deverên cîhanê dikarin cudahî û nakokiyên xwe li hêlekê deynin û mil li mil, li ser xalên hevbeş hevkarî û xebatê bikin, tenê em Kurd nikarin vê gavê bavêjin!? Gelo cudahiya nerîn, raman û baweriyan dibine sedem ku em bi çavên neyaran li hev binerin, têkiliyan ji hev bibirin!? Gelo em nizanin ku ev sîstema ramanê di rajeya kê de ye û kî sûdê jê werdigre?! Ev qonaxeke tariye, hêviyên gelê me bi xebat û jiyaneke azad qels dike û dilê şovenistan geş û hênik dike.

Lê, bi her hawî, civak bê tevger nabe, û ji ber ku tevgera siyasî digel partî û rêxistinên civaka sivîl amûrên guhertin û pêkanîna mafan e, her û her ew ji bal neyaran ve têne armanckirin, tunekirin û qelskirina wan tê xwestin.

Vêca, ji me jî tê xwestin ku em amûra xebata xwe nûjen bikin, bi rengekî nû, hişekî vekirî, destê biratiyê bidin hev û xebata gelê xwe birêve bibin, li şûna berjewendiya partiyan, em berjewendiya gelê xwe bikin armanca sereke, û em bi hêvî ne ku ev pêngava giring bête avêtin.

Li dawiyê, Silav ji giyanê damezrênerên Partiyê re, temenê xebatkarê damezrêner Xelîl Mihemed dirêj be, û serketinê ji doza gelê Kurd a dadmend re hêvî dikin!


# Ma Rûsiya di doseya Sûriyê de serdest e?

**Mihemed Qere Hesen**



Doseya Sûriyê ji hemî şopînerên ku kirîz û gelşa wê dişopînin re berçav e. Di sala ku dewleta Rûsiye 2015 an de li ser daxwaza serokê Sûriyê destêwerdana Sûriyê kir, xwe qijkir û bi hêrs hêzên xwe yên ezmanî derbas bûn, li ber dirûşma parastina dewlta sûrî ji hêzên tundrewên îslamî û terorist. Rast û çep bi firok û mûjekên xwe yên nûjen çerpand wan, ew kirar bû sedemek serkî ji hilweşandina bajar û bajarokên Sûriyê re, û kuştina sîfîlan çi jin û zarokan, û piropagende ji çekên xwe yên nûjen re çêkir û bû bazirgên diduyê li cîhanê di firotina çekan de. Ji ber wê berê çareseriyê gelşa Sûriyê li Cinêv a ku biryara Yekîtiya Netewî pê heye ber bi Esîtene ve ajot, di ser deh kongiran li wir girêdan ne ku ji bona çareseriyê ji doseya Sûriyê re bibînin, lê bû ji bona ku bi Turkiyê û Îranê re bizilma Sûriyê li hev parve bikin, û deverên di bin destên rikbera çekdar de bi Turkiyê din, wek Efrîn bi leşkerê îslamî (Xota) û hin deverên gundewarên Helebê û Îdlibê bi hev guherîn û bajarê Helebê bi hin gundewarên wê guherîn. Ango Rûsiya alîkar bû bi Turkiyê re ku pir herêman ji welêt dagîr bike, û girêkan kiftî li gelşa Sûriyê xin, wan kirarên hevbeş di navbera hersê dewletên misuger bi nav dibûn de hêşt ku rêxistinên terorist çi sune an jî şî›î li ser axa sûriyê cihên pêyên xwe bigirin tevî ku demkî bin jî, ziyanên mezin gihêştin doza guhartina Sûriyê û telbîzê ramana tundrew çi dîn çi netew di civakê de pir bibe û hev parçe bibe û kes kesî nepejrînin, di hemî aliyan de hilweşe, kend û kosp in dijwar li ser rêya çaresera dosa Sûriyê danîne.

Ketina Rûsiya li Sûriye ne bes ku wê ji terorê û parastina dewletê bû, lê nêrîna istratîcî ew e ku pêyên xwe li ber ava germ a deriya Spî bi cih bike û xwe çeke paş xêza mojekên peymana Etlesî li Turkiyê, ji ber wê bargeha Himêmîm ava kir, û bûye bingeh ku di rêya wê re destê xwe bavêje bakurî Efrîqa (Lîbiya, Malî...) kendavê û paş sînorên dewletên Etlesî. Ango kirarên dewleta Rûsiya mezintirîn mandina rijîna sûriyê ye. Û bi dewletên Rojava û Emrîka re li ser kêndiran bilîze, pir tişt jî dan Turkiyê û jê re berdan ku wê ber xwe bikişîne û ji paymana Etlesî bidize û bi dûr xîne, ji ber wê mûjekên



S400 dan Turkiyê. Bi wê girêbestê kanî arek berda navbera Turkiyê û endamên Etlesî, li ber wê dike ku derza di nabera wan de kûr û fere bike. Ta roja îro li ser wê rêya ye. Di vir de, merv dikare bêje ku Rûsiya xwe ji bîrvekir ku aboriya wê vê re ne alîkar e ku hemî pilan û pirojeyên xwe pêk bîne. Tê xuyan hêvî û daxwezên xwe ji asta aboriya xwe bilintir in, ew jî ji ramana beramberkirin bi dewletên din re hatiye.

Îro baş zelal e ku pênc leşker li ser axa Sûriyê ne, û hev du virde wêde tvedidin û dikevin qirtikên hev, yek nikane û ne jî dixweze bi yên din re leşkerî bi serkeve, hemî tersî biryara yekîtiya Netewî 2254an dixebitin, tevî ku devkî dibêjin, ji ber ku ew her dewletek bûye nûnerên aliyên hevrikê û dest danîne ser vîna wan û ji xwe re karan pê dikin. Wek çawa dewleta Turk hemî milîsên bi rêxistina Îxwan Elmisilîmîn ve girêdane li her ku bejewendiyê Turkiyê lê heye ew li wirin û bûne nandozên wan, pê êriş Kurdan, Lîbiya, Ezirbîca û …dikin.

Li aliyê din nakokên bincil û sercil di navbera Rûsiya û Îranê de hêj nehatine meyandin û li hevkirin her alîk di tenga xwe re destên berdane kûraniya rewşa Sûriyê, û pircaran bi hev re ne karsaz in û guhlihev nakin. Û girêbestên aborî ji dest hev digirin û li pêş hev direvînin. Lêdanên leşkerî yên ezmanî yên Îsrayîlê ji deverên Sûriyê re dibe sedemek ku nakokî di navbera Rûsiya û Îranê de derkevin û tûj bibin. Ji ber ku Rûsiya çavan li ser lêdanên Îsrayîl dadimirin û bê deng dimîne, Îran jî ji vê rewşê neqayîl e.

Rûsiya kar dike ku dewleta Sûriyê wek berê vegerîne, û di têkliyên diplomasî wîne sira û danişên cîhanê beşdar bike. Lê vê re bi sernakeve, ji ber pir mijar û bend hene Rûsiya lê dilikume û nikane pê rabe, ser defter rewşa aboriya Sûriye ya ketiye astengiyek pir jar û lawaz. A diduyê doseya avakirina derên hilweşîne. Sisê mijara konevanî bi pêşneketiye û hemî rûniştin li dor xwe digerin û ber û çareseriyê nadin.

Û hêj dewleta

….. 5

# Aştî û ewlehiya neteweyî…berpirsyara kê ye?

**Nazdar Hesen**

Rizgarkirina nifşên pêşerojê ji belayên şer di peymana Neteweyên Yekbûyî de di pêşgotina wê ya pêşî de ye, û ev gotin bibûn sedema sereke ji bo damezrandina Neteweyên Yekbûyî yên damezrînerên wê rastî wêranî û şerên Cîhanî hatibûn.

Û parastina aştiyê bibû erkek ji erkên wan ên bingehîn, ku ji hêla civaka navneteweyî ve dihat bikar anîn, û avakirina aştiyê di nav sîstema Neteweyên Yekbûyî de hewldanên jidil bi armanca alîkariya welat û deveran bike, agirbestan dîne û pevçûnan bidawî bike û wan ji qonaxa şer




derbasî qonaxek aştiyane bike, û ji bo birêvebirina nakokiyan û danîna bingehên aştî û geşepêdana domdar, û ji bo pêşdebirin û baştirkirina pêvajoya aştiyê û ewlehiyê dixebitîn.

Ji ber vê yek, em dikarin bibêjin berpirsyarê yekem ji ber aştî û ewlehiya Cîhanê de Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ye, ew barê berbirsyariyê hildigire, û ji ber ve berpirsyar e, lê mixabin li vê dawiyê di şerên bûnî û dibin de, helwesta wê ne zelal e û rola xwe qels û lawaz kiriye, û tenê bi daxuyanên şermok bes dike û şerê li dijî Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî, dagirkirina wan a bêsedem û binpêkirina mafên mirovan li van hersê herêman, û niha jî şerê li Ukranya rûdayî balê her dikişîne ku tu berpirsyar ji bo çareserkirin û rawestandina şer û peydakirina aştiyê naxebite û xuyatir dibe ku, dema berjewendî têne holê, tu wate ji rizgarkirina nifşên pêşerojê û parastina mafên mirovan re namîne, û tu giringî jî ji rêzgirtina serweriya yasayê û bidestxistina aşitiyê re nemaye, tenê di peymana wan de, peyv û gotin in bawerî pê nabe.

## Çiqas bêbextî tehl e!



*Dr. Memo Ebdî*

**Xêrnrxwazî piştxûz e**
**Sitûşikên e.**
**Belengazî,**
**Sed carî di rojê de**
**Mirin e.**
**Bindestî, binpêkirina**
**Rûmet û pîrozmendiya ye.**
**Pejirandina koletiyê,**
**Xwefiroşî ye.**
**Li pey mafên xwe negerî,**
**Ev dermirovî ye.**
**Tu kinks bî,**
**Çavnebar bî,**
**Tê hov û dirinde bî.**
**Di ber azadiya xwe de netekoşî,**
**Tê ne Kurd bî,**
**Ne nirov bî,**
**Û ta tu hebî,**
**Nandoz bî,**
**Keysebaz bî,**
**Û bê şan û rûmet bî.!**

**Ma Rûsiya... Dûmahîk**

Sûriyê di aliyê diplomasî de kirin quncikekî û jê bi der naxin… Ev bi xwe li ser pişta aboriyê radibin. Lê aboriya Rûsiya ne li pêş e ku kanibe Sûriyê ji nû ve ava bike û piştgiriya aboriya Sûriyê ya ketî bigire û rake. Li vir merv têdigehe ku Rûsiya di hemî mijarên doseya Sûriyê de ne serketiye, xwe wek roviyê ketî ber tepikê virde wêde divebçegirîne lê rizgar nabe, ji ber ku dewletên Rojava û Emrîkan hêştin ku Rûsiya di golgemiriya Sûriy de vegevize, hêj bihayê wê ciqas e, ne bêliye.

Merv dikane bêje ku belkî Rûsiya bi lêdana rikberiya çekdarên îslamî li hin ciyan û kirîn firotina wan bi Turkiyê re serketî be. Lê hêj li Idlibê di mijara Heyet El- tehrîr El-şam re bi serneketiye, û di tenga Kurdan re di bazara Efrînê de bi dewleta Turk a dagîrker re bi serketiye. Lê hîn li rohilatî Ferêt bi ser neketiye. Ta roja îro Rûsiya nikane zûzû leşkerê xwe li orta Qesed xîne, û dibêje em wir di rêya guftûgoyê bi rijîmê re li çareseriyê bigerin. Lê diyare Rûsiya di vê mijarê de pir ne ji dil e, belkî huner û tektîk be jî, tev rewşenbîriya hevpeyvîn û guftûgoyê bi Şamê re yan Kurdane û wiha jî doz dikin û djîtiya paytextê nakin.

**Rûsiya û doza Kurd li Sûriyê**

Ta roja îro, helwesta Rûsiya di tenge doza kurdî re li Sûriyê pir ne zelal e, û wek belge diyar nekiriye, ne di konevaniya xwe de çi li hundir û çi bi saziyên navdewletî re, û ne nêrîna xwe zelal û aşkere ji dostê xwe re (rijîma Sûriyê) re diyar nekiriye. Mayî têkliya xwe bi Kurdan re tektîkî û huner e, dixweze û kar dike ku Kurdan di bin baska rijêma sûrî ke bê ku mafên wan di destûra Sûriyê ya nû de were mikûr û belgekirin. Ev kirar tûşî vîna kurd û Emrîkan tên, loma her du rojan dirûşima têklî bi rijêmê re hildide wek kaxezek diblomasî li hember kurd û Emrîkan. A rast jî kurd tu carî têkilî û hevpeyvînê bi tu aliyan re rednakin. An jî Rûsiya kurdan bi keftarê Turkiyê ditirsîne û bi ser Kurdan de têv dide ku hin der û herêman ji dest wan bigire û bi rijîmê de, yan bê biha û nirx rijêmê bi serxîne. Tevî lîska Rûsiya û dewletên din bi duseya Sûriyê dilîzin û vedigijgijînin. Divê deriyê têkliyan bi hemiya re li ser piştê vekirî be. Û li rex wê deriyê yekrêziya Kurdan vekirî be û guftûgo di nevber aliyan de ne tektîkî bin, nakokên xwe bi hev re ko bikin, ji ber ku em li ber deriyê biharek konevanî li Sûriyê ne.

2.1.2022 an

# Kurd çi ji hev dixwazin?

**Zamdarê Zindî**

Wek hatî nasîn ku şerê bi gotinan û henasî ziyana xwe ji şerê çekdarî ne kêmtir e, şerê çekdarî mervan dikuje, avahiyan û malan kambax dike û hildiweşîne, ew jî bi xwe re derûn û qîret li ba merv diçelimisîne, ku di geregrînka gelşan de bi fetisîn û noq bike, lê şerê derûnî û henasî bi gotinan vîna merv dişkîne û bêçare dihêle, û baweriyê bi xwe nake ku karekî bike û di golek gumanan de dijî, vîn û hiş ji dest tê girtin, dibe pizdonek û acetê alîkar bi serketina dijmin re, ji ber bawerî li ba namîne, û pişta xwe dide hemî kar û ustbaran, dibe «kevirê binê bîrê « ne deng vêdikeve û ne jî haya xwe ji bûyerên dinya yê çêdibe.

Ew merv û gelê vîn şikî, xwe radestî xwedê û nêrvînê xwe dikin, û li benda mirinê ne û çareya ji ezmên de jê re dakevin dimînin. Bi nirx û hêza xwe hay nabin, û xwe ji bîr ve dikin ku herdu tişt ji xesyet û taybeta merv in, bi hişê xwe berxwedana hêzên xwezayê û hovan kiriye, û bi ser wan ketiye. Ev li ba hêzên zordar li seranser dîrokê nas bûye, ji ber wê, ew li ser wî şêweyî û rêkê dimeşîne ku hiş û vînê ji merv bistînin û bi şiyana xwedê ve girêdin, û baweriyê li ba wan çêbikin ku ew ne tutişt in, û ne kanin tiştekî bikin, ku kanibin xelkê li pê daxwazên xwe bixweşînin û karê xwe bi wan bikin.

Ev çeka han ji aliyê çewsandarên gelê Kurd ve ji zû de li dijî wan bi karanîne, di pir cih û helwestan de bi ser ketine, ji ber ku zordariya wan ta roja îro dirêj kiriye, û hêj herdu çekan (leşkerî, henasî) bi kartînin. Û gelş, nakok û gizgiziyan di navbera hêz, partî, çîn û herşên civaka kurdî de kûr û tûj bikin ku wan li ser hev bişimtînin ji hev bikin. Ta roja îro dijminên Kurdan di vê pileyê de bi rajetî bi ser ketine. Ji ber wan ûşt û sedeman li her çar perçan malbendek(merce›iyê) konevanî pêk nehatiye, ew şana ne yekbûnê û ji hevketinê ye!

Her çend rojan hukmeta Turkiyê bi serkêşiya serokê xwe Erdoxan gef û guran li herêmên Kurdan û Qesedê dide, bi bihaneya ku terorist in û ewleya me ya netewî gef dikin, piropogedekê li serê Kurdên Sûriyê çêdike, ku dê bi daneserek leşkerî rabe û xweseriya rêvber ji bin ve rake, û herêmek ewle avabike ku penaberên Sûrî lê bi cih bike, û xwe weke berketî û piştgirê wan xwe dike nîşan û hêstirên kentoran dibarîne.

Lê ya rast ew e ku hekumeta Islamî li Turkiyê li sersiyê serê Kurd û demokrasîkirina Sûriyê hez nake. Ew hêzên leşkerî yên îslamî û radîkal bi ser îslama konevanî ve kirine



bin destê xwe, ku kar û îşê xwe li herderê bi wan bike. Çi di şerê hundirî yê xwebixwe di Sûriyê de, û çi di şerên derve de (Lîbiya, Ezrbîcan…). Ew baskên leşkerî û nandoz ji xwe re wek cokêr hêştine, ku di çareseriyê konevanî û goftûyan de çi bi dewletên hukardar di rewşa Sûriyê de û çi jî bi rijima Şamê re di dema gerek û pêwîst de bikşîne.

Dewleta Turkiyê çêjmîjî (temijî) bû, ku dema rijîma Şamê di tengayê de wê rikbera leşkerî li Şamê û di ber pozê rijîmê de, wê hîngê derfet hebû, ku rijîm, Rûs û Îranî qayil bibin, ku biveya ketina rijîmê li Şamê bi dûrxînin, û cokêran ji hev re bikşînin, û herêman bi hev biguherin, wek nimûne bajarê Helebê dêvla gundewarên wê, Efrîn dêvla Xota û başûrî gundewarên Idlibê. Lê roja îro dem, mîr û rawş hinekî hatî guhartin. Rijîma li Şamê li ser lingan siknandin û ew jî doza vegerandina hemî herêmên ne di bin destê wê de dike. Ji ber wê tu alî naxwazin tu herêm in din bi hev biguherin, û hemî cokêrên dewleta Turkiyê hemî nas û berçav û aşkere bûne. Ango lîsk li pêş Turkiyê kêm bûne û pir rê li ber hatine girtin û teng bûne.

Lê tiştê hersê aliyên hukardar (Rûs, Îran, Turkiyê) di bin masê re dixebitin û kar dikin, ku yawaş, yawaş ji herêmên di bin serweriya Qesedê de jê bixwin û kêm bikin, ji serweriya rijîmê belaş û bê tu mafan bi Kurdan din. Rûs di guftûgoyên bi Qesedê re bi hophopa Erdoxan û êrîşkirin wî ya leşkerî ditirsîne, ku bê sûde herêmen dibin destan, de radestî rijîma Şamê bike. Ji bona ku ev pilan bi serkeve, hersê alî bi hev re karsazin û kar li dijî Qesedê li hev parve kirine. Turkiyê rojane şerê xwe yê henasî bi gef û gur û Hophopan, û bi balefirên vê şofêr êriş gundên di bin destê Qesedê dike û kesan dikuje…hwd. Rijîm jî di bin re, êl û eşîrên ne Kurd li serî Qesedê dihurhutîne û aramiyê çênakin, ragihandina Şamê jî li dijî Kurdan diwşe û bi perçekirina welêt bi nav .....

7

# Li Bosnayê helbestvanê Kurd ê navdar Husên Hebeş xelateke navnetweî ya helbestê wergirt



Komîta birêvebir ya Mihrecana Serayîvo ya helbstê a navnetewî, ku ji sala 1962an ve her sal lidar dikeve, di meha Gulanê de, xelata xwe pêşkêşî helbestvanê Kurd Husên Hebeş kir.

Hêjayî gotinê ye ku ev xelat ya herî bilind û nirxdar a Yekîtiya Nivîskarên Bosnê ye, ku berî niha diyarî van helbestvanên cîhanê bûye:

Tadyos Rosîvîtş ê Polonî, Mehmûd Derwîş ê Filestînî, Çarlz Sîmik ê Emerîkî, Lars Jostafson ê Swêdî, Mîkayîl Krugir ê Almanî û Pîsîra Alîkadiş a Bosnî.

Di pêşkêşkirina xelatê de wiha hate nivîsandin:

Encumena Rojên Helbestê Li Serayîvo, ji ber karê te yê balkêş di cîhana Helbestê de û xebata te di warê bilindkirina nirxên azadî û mirovahiyê de, ev xelat liyaqê te dîtiye.

Di kongreya rojnamevanî ya ku bi vê bûneyê lidar ket, Serokê Encumena Rojên Helbestê Li Serayîvo birêz Mayil Sitocitş wiha got:

«Husên Hebeş kesayetiyeke taybet e, ji ber ku ew li ser wêrankirina welatê Kurdan dinivîse, û terora ku li dijî gelê Kurd bikar tê, bi rêyekê ew ji me ve nêzîk e!»

Em jî bi navê Rojnameya NEWROZ helbestvanê xwe, helbest û wêjeya Kurdî pîroz dikin.

## Li Qamişlo kesayetiya welatparêz û Kurdhez ŞEMSEDÎNÊ DERBAS koça dawî kir

Îro, roja Pêncşembê 23.06.2022an, piştî bexwedaneke dirêj bi nexweşiya penceşêrê re, li bajarê Qamişlo, kesayetiya welatparêza navdar Şemsedînê Derbas çav girtin û di 66 saliya xwe de çû ber dilovaniya Xwedê. Berî nîvro di heman rojê de, bi beşdariya gelek welatparêz, dost, heval û hogirên wî, bi xemgîniyeke mezin ew li goristana Qidûr Beg hate veşartin.

Ji biçûkaniya xwe ve, Şemsedînê gorbihuşt xwediyê aşê hêranê bû, bi demê re, asta zanebûna wî ya mîkanîka bilind bû, wî aşên mezin çêkirin, û kompaniyek bi navê «Kompaniya Derbas» damezrand. Ewî, gelek amûrên nû afirandin ku bûn cihê dilxweşiya kompaniyên cîhanê yên navdar û ew li derveyî welêt hatin firotin.

Ji bilî dahênanên (إبداعات) wî di ware çêkirina amûrên pîşesaziyê de, ew kesekî mirovhez bû, destê qencî û



alîkariyê dirêjî hejar û belengazan dikir û xemên wan sivik dikirin.

De bila cihê wî bihuşt be, serê malbat, dost û hezkirên wî sax be.

**Kurd çi... Dûmahîk**

gunehkar dike. Cokêr û kaxeta herî mezin û bi hêz li dijî Qesedê kişandine girtiyên Da›êş di girtîgeha Hesekê de bi şerekî çekdarî livandine, ew cokêr bi berxwedana şervanên Qesedê û piştgiriya dostên wan şewitîne û beravêtî bûne.

Tê xuyan ku Rûs û rijîmê hinekî liva xwe guhartine, ku Rijîmê bi şêweyê leşkerî nerm di bin dirûşma parastina sînor ji êrişên Turkiyê derbasî herêmên di bin dest Qesedê dibin. Ew jî bi têvdana Turkiyê li ser Kurdan û hukariya rijîmê di herêma di bin destê Qesedê de pir û xurt dibe. Merv sibe ji vê livê û hukdariya leşkerî bi tirse ku li dijî Qesedê bixebite û gelş û girêkan re çêbike.

Gelek aşker e û tê xuyan, ku dijminê Kurdan bi şev û roj xew nakin, çi bi dizî û çi jî aşkere dixebitin û pilanan dirêsin û digerînin, ku Kurdan bişkînin, tevî ku çiqas cefa û ked dane û kişandine, û xaka Sûriyê ji roja çêbûye de bi xwîna xwe avdane û hêj didin, nemaze di van salên dawî de, me çiqas ziyan da. Li hember vê babelîtan û kujtaran, tevger û hêzên Kurdî li ku rawestîne û çi dikin? Pirtirî dijmin çi ji hev dixwazin?! Hinan xwe dane rex Turkiya dagirker û hin aliyên Kurdistanî dijîtiya aliyê din dikin. Nakokî û arê bi dijmin re vêxin, di nav xwe de vêdixine her yek alî, dostên û cemwerê xwe li dijî hev li ber germ û tûj dikin. Ev dema pir giring û dîrokî ji bîr kirine û ketine bi rûyê hev, ev kirarin ne baş in. Ger em vê demê bi derdin, tu ax û of, keser û lome ne derman in!

18.06.022 an

# Kuştin çi ye? kengî mirov dikûje û çima?

**Rojîn Qido**


Elya›i Ebdo Ebo

Ev pirsên ku mirov dikare rojane ji xwe bipirse, dikare jî dev jê berde û jiyana xwe normal berdewam bike. Lê ya ku hertim hizirandineke wisa vedigerîne hiş û bal ew e, dema ku bûyerên wisa rojane dubare dibin. Ango divê ku em li ber deriyê pirsan aciz nemînim û bersivên pêwîst jê re bibînin.

Hema ji demeke nêzîk li Suriyê li bajarê Helebê di dîroka 09.06.2022 an de, nava taxên ku kurd bi piranî lê dijîn, keçkeke çar salî bê guneh hat kuştin. Mirovkuja ku destên xwe bi xwîna keçikê şuştibû hat naskirin û niha li benda cezaya xwe di reştariya zindanan de maye. Tiştê balkêş ku mirovkuj jî hîn di temenê zarokan de ye, yanê 18 salî ye. weke hat belavkirin ku wê di nava grûpek bi rêk û pêk de - karê ku derveyî têghîştina mirovan tevahî, bazirganiya mirovan û bi taybet «zarokan» dikirin- kar dikir. Ji ber wê, mirovkujê da ku guharên zêrîm ji guhên keçikê bi zorê bistîne an jî bidize, kir ku guhên wê biqelşîne. weke ku kîneke xwe pê re hebû bi kêrekî tûj giyana «Elya›i» kişand û kir ku malekî biçûk têra çar salên wê dikin di goristaneke bê deng de hebe. Buyera hana, kir ku hêrsa malbata «Elya›i», dost û xerîb bilind bibe û banga dezgehên ku wî perçî birêve dibin bikin, da ku jina ku jiyana zarokan bi erzanî firotî û wijdana wê gotir kirî ku derbasî kirineke bi carekê ne di rêzikên mirovatiyê de bibe were cezakirin, ango kuştin bi kuştineke mezintir. xwestin ku bi laşa wê li taxa «Şêx Maqsûd» tev were nûnerkirin, da ku bibe mînakek ji yên ku dil û wijdanên xwe avêtine û ji bo çi be bila bibe, tu carî nefikirin wisa bikin.

Eger ev jina han bi sed qurşînan hat kuştin, ger bi hezar benî sitwa wê hat girêdan, ger laşê wê bi tifa xelkê hat şuştin, bi kevir û zinaran hat avêtin, wê bimire belê, û sed carî ji bilî carekê, wê agirê di hundir dilê civakê de hinekî li hemberî kirarê wê were vemrandin.

Lê pirsa min ew e, ma wisa çare pirsgirêkê tê dîtin û wisa li şûna xwînê gul hema vedibin? Li vir em dê dîsa behsa pirsan bikin, çima mirov dikûje? Sedema sereke ji bo mayînê ye, ango mirov dest bi kuştina lawiran kir, da ku hebûna xwe li ser ruyê erdê bihêz bike. Yanê ew dikare bikûje ne nikare, lê hertim di nava rêzikên mirovatî de karînên xwe kedî dike.

ji xwe tu cudahî di navbera mirov û lawiran de -ger wisa be- tune ye; Lê, aqil dihêle mirov pîroztir bimîne di nava giyanweran tev de. Niha tê naskirin ku ger aqil tendurust be, mirov hîn dikare weke xwe bimîne, lê eger pirsgirêkên mejî çêbûn, wê demê mirovahî ber pişaftinê diçe.

Weke mînaka berdest «Elya›i», eger em aqilê wê bipîvin, em ê zanibin ku çima tu gunehên wê tune ne? Ji ber ku zarok e û mejiya wê bi temamî hîn nehatiye avakirin, yanê hîn nikare xwedî bersiv be û nedikare xwe ji metirsiyan biparêze.

Êdî tê xuyakirin sûc û pirsgirêk tenê di mejiya mirovkujê de ye. Niha jî em dikarin texmîn bikin, Çima wisa kir? Di rewşên wiha de, divê ku herdu alî werin naskirin, ji ber ku carinan kesê kuştî jî sûcê radike.

Sedemên kuştinê gelek in, jê yên sereke ev in:

Tirs, birçîbûn, zilim û zor... Ev sedem jî bêtir di hundir rewşên şer de diqewimin. dema ku mirov li hember peydakirina pariyek nan e ku devên zarokên xwe pê şil bike bêçare dimîne.

Êşa ku girêdayî tunebûnê be, dihêle mirov bê çare bimîne û zû ji çermê xwe derkeve û hovîtiya ku di hundir xwe de azad bike. Lê, di vir de mirov dibe curbecur, yanê di şer de heye ku civakek tev de ji hev dibe û di nava hurdekên biçûk de êsîr dimîne, rêzdariya di navberî xelkê de hildiweşe û rûyên wan zelaltir dibin.

Kîn -ger ne ji hevdû- ji siyasetê, ji jar û tunebûnê, ji dunyayê çêdibe û mezin dibe, da ku dighêje asta kuştinê. Ger mirov ji bo xwarinê cîranê xwe yê têr nekûje, wê di dawiyê de xwe -bê guman- bikûje, an jî bi destê birçîbûnê li benda kuştineke asayî bimîne, weke ku Aristo digot: «Xizanî bingeha şoreş û tewanê ye».

Rast e jî ku ceza di heman demê de pêwîst e, ji bo ku tewankar bi şaştiyên xwe mikûr bibin û dubere nekin; Lê, ne tenê wisa tê xwestin, ji ber ku ger mirovkujek were kuştin û cezaya xwe bibîne û mijar were tepsandin, dê sibe -hema ne gelek dûr- ji bo pere, nan û avê sed mirovkujên din derkevin holê.

Ji ber wê li gel ku em hewildidin mafê bêgunehan bistînin, divê em koka mijarê baş bikolin û kurmikên ku di nav de bûne hov ji binî ve wêran bikin. Avakirin ne tenê yek bi yekê ye, lê belê yek bi hizir û aqil e. Çimkî ger ne wiha be, em ê bighêjin rojekê -îro weke kurd û paşê weke mirovatî- ku me xwebixwe tune kiriye

# Li Navenda Qamişlo ya PYDKS Cejna Rojnamevaniya Kurdî hate pîrozkirin

Desteya sernivîser



Bi helkefta Cejna Rojnamevaniya Kurdî, roja 22ê Nîsanê 2022Z, bi beşdariya birek ji nivîskar, rewşenbîr, berketiyên zimên û hunemendê Kurdê dengxweş birêz Sed Ferso ahengeke pîrozbahiyê lidar ket.

Li destpêkê, ragihandêrê Kurd birêz **Dilşad Ebdo** xêrhatina mêvanan kir û bi xuleyeke bêdeng li ser giyanê pakrewanan û sirûda netewî EY Reqîb dest bi ahengê kir. Pişt re, nivîskarê Kurd birêz Konê Reş li ser kurtejiyana rojnameya Kurdistanê axivî û hin movikên bijarte jê xwendin, û rola erênî ya malbata Bedirxaniyan di wêjeya Kurdî de da xuyakirin. Herweha, ew li ser dilgermî û comerdiya siyasetmedarê Kurd ê naskirî, gorbihuşt Ismaîl Umer/Serokê Partiya Yekîtî Ya Demokrata Kurd Li Sûriyê peyivî, û çawa di roja Cejna Rojnamevaniya Kurdî de, wî rewşenbîrên Kurd xelat dikirin, bi wan re diçû seyranê û dibû hevparê derd û xemên wan.

Paşê, mamoste **Faris Osman** li ser pirtûka xwe ya li ser rojnameya Kurdistan çap û belav kiriye peyivî û da zanîn ku xwediyê rojnameyê ji Kurdan xwestiye ew fêrî xwendin û zanînê bibin û guhdanê li têkiliyên Kurd û Ermenan bikin, û bila Kurd nekevin dav û pîlanên Sultan Ebdulhemîd, û her Kurd û Ermen li hember dewleta Osmanî hişyar û yekdest bin.

Pişt re, li ser navê Kovara PIRS û Weşana Newroz, birêz **Nûşîn Bêcirmanî** gotineke nivîskî pêşkêş kir, ev e deqa gotina wî ye:

(**Rojnamevan, dezgehên rojnamegerî û beşdarên birêz...**

Bi navê weşana Newroz û kovara Pirs, em salvegera roja rojnamegeriya Kurdî, di roja derçûna yekemîn rojnameya bi navê KURDISTAN li ser destê mîrê gewre Miqdad Midhet Bedirxan li we tevan, pîroz dikin.

Bê guman, rojnamegerî karê westan û serêşê ye, roleke herî girîng di jiyana miletan de dilîze, rojnamegerî her tim têkildarî civakê dibe bo zanîn, bûyer, çalakî, lêkulîn, rapor û hwd, di rûpelên rojnameyan de belav dike. Hewil dide ku kevin, nû û siberoj bi hev ve girêbide. Bi kurtî ji bo em dirêj nekin, rojnamegerî jiyana netewa xwe bi neteweyên din re hevbeş dike.

Miletê Kurd jî ne cuda ye ji miletên din di vê rewşê de, dema yasaya çapemeniyê li Misrê sala 1891ê de derket, nemir Miqdad Midhet Bedirxan jî rêdana weşana rojnameyekê bi navê KURDISTAN xwest û di 22ê Nîsana 1898an de jimara yekê ji vê rojnameyê weşand, weşan jî rewşenbîrî bû, di jiyana miletê kurd bi rola hînkirin û hişyarkirina miletê kurd radibû û di heman demê de jî dengê wî digihande miletên cîhanê. Nemir û weşana wî rastî gelek kelem û rêgirtinan bû, bi sedema destêwerdanên Selteneta Osmanî ku hewil dida di riya fişarê de li desthilata li Misrê bo ku rê li ber bigirin, ji wilo berê xwe dan Ewrupa li wir rojnameya xwe weşandin û cardî vegerehan Misrê, di dawiyê de jimara 31 ya dawî bû li Cinêvê di 4ê Nîsana 1904an de hat weşandin.

Karê rojnamegeriyê di pey re ranewestiya, gelek kovar û weşan jî bi zimanê Kurdî derçûn, mîna Hawar, Stêr Ronahî û hine din jî. Lê ji sala 57an bandora siyasetê li rojnamegeriyê bûye, hinekî dûrî çand û rewşenbîriyê ketiye. Tevî wilo mînakin hebûn ji rojnamegeriya serbixwe re weke Gulistan, Nûbihar, Zanîn, Newroz û Pirs jî ku ta niha jî di weşana xwe de bi zimanê Kurdî û tîpên Latînî berdewam in.

Newroz û Pirs dê berdewam bin li ser rêça xwe bo xizmeta doza miletê kurd û welatê wî Kurdistan, mil bi mil bi rojnemeyên heyî bo xizneta Çand, zanyarî, ragihandin û zimanê Kurdî.

Silav li Giyanê mîr Miqdad Midhet Bedirxan, mîr Celadet, Cegerxwîn û Apo Osman Sebrî û hemî xebatkarên zimanê Kurdî

Silav li ro-.....

10

**Li navenda... Dûmahîk**

jnamevanên Kurd serkeftin ji rojnamegeriya kurdî ya azad re...

Spas

Qamişlo 22/4/2634 K/ 2022 Z

weşana Newroz û Kovara Pirs).

Birêz **Dr. Azad Elî**/Berpirsê Desteya Kovara El-Hîwar gotineke devkî ji beşdaran re pêşkêş kir, sipasiyên xwe ji wan û komîta amadekara ahengê re derbirî û hin nerîn û pêşinyarên xwe sebareta cejna rojnamevaniyê anîn zimên, û got îde gereke ev aheng bi rengekî nûjen bê pîrozkirin û ew ji vî rengê kernefalî kilasîkî derkeve, û wî tekez kir giringe ragihandina Kurdî nebe çekek di destê partiyan de ku pê şerê hev bikin!

Birêz **Newafê Bişar** jî gotineke nivîskî pêşkêşî beşdaran kir, ev e li jêr deqa gotina wî ye:

**(Cejna Rojnamegeriya Kurdî li we û gelê Kurd pîroz be!**

**Xwişk û birayên rêzdar…**

**Beşdarên bi rûmet…**

Hemû demên we xweş bin, her dilgeş û şad bin…

Li destpêkê, bi kurtî be jî, dixwazim hinekî li ser dîrok û jiyana “Kurdistanê” çend gotinan bibêjim.

Ji ber sedema nesaxiyê, li zivistana sala 1898an, bi armanca dîtina dermanekî ji êşa xwe re, **Mîr Miqdad Midhet Bedirxan** ji Istenbolê berê xwe dide Misrê û demekê li paytexta wê Qahîre dimîne. Li wî bajarî dibîne bê çawa ku xelk dixwînin û di warên zanîn, wêje û pîşesaziyê de gavên mezin û berfireh davêjin, bi dehan rojname, kovar û pirtûk têne çapkirin û belavkirin, ew ên ku rêya pêşketinê li ber gel ronî dikin, ramana wî geş dikin û wî bi nûçe û bûyerên giring serwext dikin.



Mîr, bi kul û hesreteke mezin vê rewşê bi ya gelê xwe re berhev dike, digihe wê encamê ku gava pêşîn ji bo pêşketina gelê Kurd, belavkirina zanînê ye. Û pileya pêşîn ji belavkirina zanînê jî weşandina rojname û vekirina dibistanan e. Ji ber vê baweriyê, ew biryarê dide ku dest bi vî karî bike û ji bo Kurdan rojnameyekê bi zimanê Kurdî li Qahîreyê biweşîne, û her car 2000 hejmaran jê rêke Kurdistanê da ku Kurd bixwînin û asta zanebûna wan bilind bibe.

Li roja Pêncşembê 22ê Nîsana sala 1898an xebata wî ber digire û hejmara yekem ji rojnameya xwe ya bi navê **KURDISTAN**, bi zimanê Kurdî û tîpên Erebî Osmanî diweşîne.

Bi vî karê xwe yê mezin, ku di dîroka gelê Kurd a nûjen de yekemîn rojname bi Kurdî tê çap û belavkirin, mîrê me zimanê Kurdî guhestiye asteke nû. li kêleka zimanên gelên cîhanê cîwar kiriye, rûmeta wî parastiye, û mîna hemû gelan, gelê Kurd jî bûye xwedî ragihandin û rojname, û vêga ew roja dîrokî, ji me re bûye rojeke pîroz, bûye şahî, bûye cejina rojnamegeriya Kurdî.

Di pêşgotina hejmara yekem de, mîrê me armancên xwe ji derxistina rojnameyê wiha diyar kiriye û gotiye:

…»*Sed hezar şikr û hemd ji Xwedê te’ala re em misilman xulq kirin, û zanîna i’lm û me’rifetê re hiş û zeka da me. Derheqa e’limandina i’lm û me’rifetê re, gelik ayetên celîle û ehadîsê şerîfe henin. Dinyayê de, çiqas misilman hebin, gund û bajêrên hemiya de, mekteb û medrese û cerîde henin. Dinyayê de çi dibe, çi nabe, cerîde dinivîsin. Heyfa min têt ji Kurda re, Kurd ji gelik qewma zêdetir xwey hiş û zeka ne, camêr in, dînên xwe de rast û qewî ne, xurt in, û dîsa weke qewmên dî ne xwenda ne, ne dewlemend in. Dinyayê de çi dibe, cîranê wan Mosqof çawe ye, wê çi bike, nizanin. Lewma, riya Xwedê de min ev cerîdeya ha nivîsî. Bi izna Xwedê te’ala, paş niho her pazde roja de carekê, ez ê cerîdekê binivîsim.*

*Navê vê, min kiriye”Kurdistan”. Vê cerîdeyê de, ez ê behsa qenciya i’lm û me’rifeta bikim, li kû derê mirov di’elime, li kû derê medrese û mektebên qenc hene, ez ê nîşa Kurda bikim, li kû derê çi şer dibe, dewletên mezin çi dikin, çawe şer dikin, ticaret çawe dibe, ez ê hemiya hikat bikim. Heta niho, kesî cerîdekî holê ne nivîsîye. Ev cerîdeya min a ha, ya e’wilî ye. Lewma, wê gelik kêmayî hebitin. Ez hêvî dikim kêmaya cerîdeyê ji min re binivîsin. Hemî tişt wekî nû çê dibin kêm in, paşê hingî diçe, dikeve rê de. Eve êdî ez ê dest meqsedê bikim. (we mine ellahî el tewfîq)...”*

Lê sed mixabin, piştî derçûna vê rojnameyê ku ji Kurdan re cihê dilxweşî û mizgîni- …..

**Li navenda... Dûmahîk**

yeke mezin bû, zikreş û kîndarên derdora Sultan Ebdulhemîd dilteng û çavsor bûn, ji Xinkar xwestin ku yekser ew rê li ber derçûna vê rojnameyê bigre, rawestîne. Sultan radibe hoşdariyê dide mîr **Miqdad** û dibêje ez nahêlim li ser qada dewleta Osmanî ku Misir parçeyek jê ye ev rojname bête weşandin!

Mîrê gewre çendî naman ji Xikar re dişîne û hêvî dike ku ew derfet û rêdanê bide rojnameyê ji bo ku ew asta zanînê li ba Kurdan bilind bike, lê Sultan gotin û hêviyên mîr nabihîze, wan red dike! Mîr neçar dibe, piştî belavkirina hejmara 5an a ku roja 27ê Muherrem a 1316 ê Koçî beramberî 16ê Hizêrana 1898an, ew rojnameya xwe radiwestîne û vedigere Istenbolê rûdine, jiyana xwe berdewam dike. Piştî demekê, birayê wî mîr **Ebdurehman Bedirxan** barê berdewamiya wê rojnameyê hildide ser milên xwe û di pêşgotina hejmara 6an de wiha dibêje:

… »*Ev cerîdeya ha, heta niho, birayê min Miqdad Begê dertanî, lakin, çiku Xinkar nehişt ew li Misrê rûnit, vegera Istanbolê. Cerîdeya xwe nikarî Istambolê derînit, seba wê jî çiku mirovê mezin yên dor xinkar hemî xayin, bê esil neseb in, neyarê ciwnmerda ne, çi xesma ku yek ji wan heye navê wî* ***Ebu El Huda*** *ye. Ew temamî esil û neseb mitirb e. Çiku ew ji hemiya bê esiltir e, ji hemiya zêdetir neyarê mala Bedirxan Begê ye. Ew neyarê hemî Kurda ye, navê qencî li Kurdan bibe. Ew Xinkar dixapîne. Be rastî, ew ne Ebu El Huda ye, ew Ebu El Delal e, fusq û hesedê de bê heval e! Ew nahêle lawên Bedirxan Begê cerîdeyek holê derêxin da qencî ji Kurda re bibit. Lewma ez ku lawê* ***Bedixan begê*** *me, ji te'esub û himyeta xwe, ji milkê Xinkar derketim hatim diyarên xerîb da ez vê xidmetê ji weten û ji miletê xwe re bikim. Ji kerema Xwedê hêvî dikim ku Kurd jî pê vê cerîdeyê ji xewa giran a kevnesala şiyar bibin..."*

Di merc û hoyên pir dijwar de, ji derveyî sînorên dewleta Osmanî, li derbideriyê û her çend mehan ji welatekî Ewropayê, Ebdurehman Beg 26 hejmarên din weşandine. Û "KURDISTAN" a hêja ku ji gelê Kurd re bûye jêder û samaneke mezin, li hejmara 31an yekcarî radiweste, çavan digre, û navê xwe bi tîpên zêrîn di dîroka gelê Kurd de dinivîse!

Wekî çawa wê demê mirovên zikreş û kîndar ên mîna Ebû Elhuda hebûne, dijayetiya gelê Kurd kirine, îro jî ew bi hizaran hene, û da ku li hember daxwaz û azadiya Kurdan kelem û astengan peyda bikin, ew hemû bi hev re dixebitin û hewl didin dîrokê şûnde vegerînin. Di vî warî de, mînaka herî berbiçav û balkêş rewşa **Efrîn, Serê kaniyê û Girê spî** ye ku berpirsên dewleta Turkiyê ya dagirker digel hêzên tariyê yên terorist ku navê Artêşa Netewî a Sûriyê li xwe kirine, li ber çavên civaka navnetewî tewanên mezin ên kesnedî dikin, bi darê zorê şêniyên deverên dagirkirî ji gund û bajaran hildikin, Turkmen û Ereban li şûna wan cîwar dikin, dar û daristanan dişewitînin, şûnewarên Kurdan û her tiştê têkildarê dîrok û hebûna wan in, wêran û winda dikin!

Bi kurtî, mirov dikare bibêje ku tewaneke dijî mirovatiyê li deverên Kurdî yên dagirkirî birêve diçe, pêwiste hemû mirovatî li hember wan kirarên hovane serî hilde, û da ku artêşa Turk a dagiker ji xaka Efrînê û hemû deverên Sûriyê vekişe û ew tewanbarên destbixwîn li hember dadgehine dadmend bêne darizandin, kar û xebateke îjdil bike.

Li dawiyê, di vê bîranîna pîroz de, pêwiste em keça Kurd a navdar Zara Muhemedî ya ku ji bo fêrkirina Zimanê Kurdî, ji bal rijêma Iranê ya hov a kevneperest ve bi 5 salan hatiye zindankirin bibîr tînin, û em Cejna wê, û ya hemû xebatkarên zimanê Kurdî pîroz dikin, daxwaza azadî û serbestiya wê dikin, ji ber ku zindan ne cihê xebatkar û aştîxwazan e, lê ew cihê çavsor, sitemkaran e!

Cejna Rojnamegeriya Kurdî li we û gelê Kurd pîroz be!

Spas

22 ê Nîsanê 2022 Z).

Helbestvanê Kurd birêz **Zahid Xelef** jî gotinek pêşkêş kir û gurzeke ji helbestên xwe yên şêrîn û watedar xwendin.

Rewşenbîr, zimanhez û bizîşk **Mihemed Elî Ebdî** jî, gotinek bi zimanê xwe yê petî pêşkêş kir, li ser rola Bedirxaniyan di jiyana wêjeyî û ramyarî de axivî, û da zanîn ku derçûna rojnameya Kurdistan sala 1898an, şoreşeke çandî mezin bû, ku asta zanînê li cem Kurdan bilind kir. Herweha, aşkera kir ku îro, zimanê Kurdî di rewşeke nû de dijî, bi sedê hezaran keç û lawên Kurdan bi zimanê xwe dixwînin, bi sedan pirtûk, rojname, roman û helbst têne çapkirin, zimanê Kurdî li dibistan û zanîngehan tê fêrkirin û bi sedan Êzge û TV bi zimanê Kurdî weşanê dikin. Lê, ewî jî tekez kir ku ew dezgeh dûrî propagandeya partiyetiyê bibin, û ragihandin ji bo gelê Kurd û doza wî bibe.



Li dawiyê, birêz **Konê Reş** bi "**Xelat Kemal Henan**" hate xelatkirin, û bi deng û awazên hunermend **Sed Ferso**, aheng bidawî bû.

# Emîne Kakebaveh nimûneya jina Kurd a xebatkar e!

**Desteya NEWROZ**

Li navîna meha Gulana bûrî, ji bo wergirtina endametiya Hevbenda NATOyê, dewleta Swêd û Finlendayê daxwazên endametiyê pêşkêş kirin. Lê, ji ber ku, yek ji zagonên endametiya Natoyê erêkirina hemû endaman pêwist e, dewleta Turkiyê ji bo erêkirinê, daxwaza qelenê xwe kir, û mercên xwe ji her du dewletan re aşkere kirin!

Turkiyê ragihand ku her du dewlet bi teroristên Kurd re têkildar in û piştgiriya wan dikin, ne tenê wilo, teroristan di parlementoyê wan de cih girtine! Herweha wê dupat kir ku ew li ser daxwaza herd du dewletan erê nake ta ew soz nedin ku têkiliyên xwe bi terorê(!) re nebirin, piştgiriyê nedin wan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, û wê navên hin siyastmedar û çalakvanên Kurd pêşkêş kir da ku ew ji bo Turkiyê bêne radestkirin!



Di vê biwarê de, siyasetmedara Kurd, endama parlementoya Swêdê birêz **Emîne Kakabaveh**, ku hikûmeta Swêdê bi dengê wê desthilat bûye, bêdeng nema û li dijî destêwerdana Turkiyê serî hilda, di parlemetoyê de, rexne li hikûmetê girt çawa ew rê dide dewletekê mîna Turkiyê ku ji ber dewleta Swêdê ve hilwestan bigre! û xwest ku ew mercên Turkiyê bêne redkirin. Yan na, eger hikûmet xwesteka Turkiyê bipejirîne, ew ê dengê xwe ji bawerpêdanê bikişîne û wê birûxîne!

Emîne Xan jineke Kurd e ji Rojhilatê Kurdistanê ye, sala 1970 li gundekî girêdayî Seqezê ve hatiye dinê, di 13 saliya wê de, berpirsekî dewleta Îranê dixwaze wê ji xwe re bike jin û fişarê li malbata wê dike, ew neçar dibe, diçe Çiyê, tevlî partiya komele dibe, çek hildigre û dibe pêşmerge, berevaniyê di ber rûmeta gelê xwe de dike.

Sala 1992an, ew penaberî welatê Swêdê dibe, bi roj dixebite û bi şev dixwîne, alîkariya mabata xwe ya (8) nefer li Îranê dike. Bawernameya majistêr di Felsefeyê de ji zanîngeha Stokholmê werdigre û ji sala 2008an ve, ew endama parlementoya Swêdê ya herî çalak û bi nav û deng e.

Silav ji xebat û têkoşîna Emîne kakabaveh û hemû xebatkarên dilsozên Kurd re!

## Peymana LOZANê

**Eskerê Boyik**

Hey Kurdno, Peymana **LOZAN** a wêran, wek kapekî koletiyê î rezîl, birêz Ewropiyan avêtine ustiyê WE, hun perçe-perçe kirin. Kirin Bakûr, Başûr, Rojava û bextê her perçekî dane destê Ac-tiralê Rojhilata qaftariye bê wîjdan…

Hûnê kengê hişyar bin, 100 sal êdî derbas dibin, gelo bes nine, kê yê wî kapê rezîl biqetîne û ji ustiyê we derxîne?



Dagerkir, sal bi sal wî kapê koletiyê dişidînin… Hûn dixwezin ev perçe jî bibin wek Rojhilat ku 400 sal berê Mela Idrîsê Kurd kir qurbana Ecema…

*14.06.2022*

## Mamoste Ebddilmenan Şêxo jî koça dawî kir

Roja 06.07.2022an, derengî şevê, li bajarê Efrînê, mamoste **Ebdilmenan Şêxo** (jidayîkbûn 1946- gundê Qenterê), xatir xwest û ji nav me bar kir.

Siba roja 07.07.2022an, bi beşdariya dost, heval û hogirên wî, bi xemgîniyeke mezin, bi xaka welêt hate spartin.

Mamoste Ebidilmenan, bi hezkirina xwe ji zimanê Kurdî, wekatparêzî û dilsoziya xwe li Çiyayê Kurmênc kesayetiyekî navdar bû.

Bi navê Desteya Newrozê û xwendevanên wê, em serxweşiya malbata wî, dost û hogirên wî dikin.

**Cihê wî bihuşt be.**



**Desteya Newrozê, Cejna Qurbanê Li We Pîroz Dike**

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**